Kurdistan

Rojnameyek ji aliyê ragihandina navendî ya PDK-Sê ve tê weşandin

PDK-S 1957 Partiya Demokrata Kurdistan - Sûriya

Rojnamakurdistan.com | Kurdistan-Hejmar (264) | Adar / 01-03-2024

# Kurdistana Sûriyê.. Ji ber rewşa zehmeta jiyanê koçberî zêde bûye



Kurdistan

Pêla koçberiya ciwanan li seranserî Sûriyê bi taybetî li Kurdistana Sûriyê ji bo welatên derve ji destpêka 2011'an û ta niha berdewam e, ku bi awayekî berçav diyardeya koçberiya ciwanan rojane ber bi zêdebûnê ve diçe, û bê guman ev yek bandoreke berfireh li pey xwe ve aniye, bi rêjeyeke mezin herêmên Kurdî ji ciwanên jêr 18 salan ve hatiye valakirin, ji ber rewşa nebaş a ewlehî û jiyanê, şer û siyaseta girtin û kuştin, kiryar û binpêkirinên li ser Kurdan tê kirin, bûne sedema derbiderbûna bi sedan bi hezaran Kurd bi taybet hejmara ciwanan ya herî bilind e, ew bi riyên qaçax re bi armanca xwe bighînin Ewropayê, jiyana xwe dixin metirsiyê de û li belem û keştiyên mirinê siwar dibin, di van riyan de bi hezaran keasn jiyana xwe ji dest dana û xeniqîne ji bo bigihêjin jiyaneke aram û tijî hêvî û xewnên li welatê xwe windekirin li welatên din bidestbixin.

Derbarê mijara koçberiya xelkê de, bi taybet di nav ciwanan de li ser asta Kurdistana Sûriyê, Şirovekarek dibêje: Gelek sedemên koçberiyê hene ji wan; pirsgirêkên bingehîn li pêşiya xortan derdikevin( Leşkeriya neçar) ku rojana ji aliyê çekdarên PYDê ve têne revandin.

> «Rewşa abûriya xerab rê li ber zêdebûna koçberiyê vekirî ye»

Nebûna ewlehî û aramiyê li navçeyan, ji revandina zarokên temen biçûk û operasyonên berdewam yên leşkerî. Têkçûna proseya xwendinê li navçeyên Kurdî dibe cihê metirsiya xelkê, û ji bo pêşeroja zarokên xwe ew neçarin berê xwe bidin welatên derve ji ber piraniya dibistanan rêbazên xwendinê yên rêveberiya PYDê tê dayîn ku heta niha ti danpêdaneke fermî ne navdewletî û ne jî herêmî pê nehatiya kirin.

Şirovekarekî din jî wiha dibêje: Kêmbûna derfetên kar û rewşa xirab a aborî û jiyanê bi awayekî tund bandorê li ser gelê Sûriyê bi giştî dike, ev yek tê wateya ku ji dema rêveberiya PYDê desthilat ji rêjîma Sûriyê wergirtiye, zext û kiryarên wê li ser erdê hiştiye piraniya xelkê Kurdistana Sûriyê koçber bibin û herêmên Kurdî werin valakirin.

Ji aliyekî din ve, yek ji sedemên herî giring yê Koçberiyê kirîza hêmana aborî ya zehmet ku bûye xala bingehîn ji hejarî û belengaziya welatiyan, ku tûşî alozî û astengiyên dibin ji aliyê kêmbûna peydakirina xizmetguzarî û xwestekên jiyana xwe ya rojana derbarî bûhabûna nirxê hemû alav û kelûpelan û ev yek bandoreke neyînî li ser jiyana xelkê dike.

Di berdewamiya kirîza bilindbûna hemû cûreyên pêdeviyên gerek weku Nan, Elektirîk, Xaz, tendirûstî, êdî dibe cihê nerazîbûn û nerehetiya welatiyan, ku rûbirûyî kêşeyên dijwar ên aborî tên, astengî û zehmetiyên dikşînin, ji vî awayî ew rêya koçberiyê li pêşiya xwe xêzdikin.

> «Pêwîste rê li ber koçberiyê were girtin»




## Zêdetir bixwîne...


Xerabî û xwarî ti carî dewam nake — Rûpel—3

Mîrê bizqê Seîd Yûsif.. Hunermendekî bêhempa — Rûpel—4

# 45 sal bi ser koça dawî ya Mela Mistefa Barzanî re derbas dibin

Kurdistan

Mistefa Barzanî di 14ê adara 1903an yê li gundê Barzan a li Kurdistana Başûr jidayîk bû.
Mistefa Barzanî di sala 1943an de dest bi karê şoreşê li dijî rejîma Iraqê kiriye û rêveberiya tevgera rizgarîxweziya gelê Kurdistanê kiriye.
Mela Mistefa Barzanî sala 1919an beşdarî şoreşa Şêx Mehmûdê Hefîd dike û dibe berpirsê hêzeke 300 kesî. Sala 1920an Şêx Ehmed Barzanî Mela Mistefa dişîne cem Şêx Seîdê Pîran li Kurdistana Bakur ji bo ku hemahengiyek di navbera şoreşa Şêx Seîd û şoreşa Şêx Mehmûdê Hefîd bê kirin.
Mela Mistefa di salên 1931-1932an de, li devera Barzan û li gundên Mêrgesor û Şêrwan fermandehiya pêşmergeyên ku şerê Înglîz dikirin, dikir. Jîrbûna Mela Mistefa di warê serbazî û şerkeriyê de li wir eşkere bû.
Sala 1932an dema hikûmeta wê demê ya Iraqê bi alîkariya Birîtanya êrişî hêzên kurd, Şêx Ehmed Barzanî tê girtin ji ber wê jî Mela Mistefa dest bi rêbertî û rêxistina hêzên Kurd dike.



Hikûmeta Iraqê salekî piştî wî şerî lêborînê bo hêzên Pêşmerge û malbatên Barzanî derdixe ji ber wê jî ji sala 1936 heta 1943 çalakiyên serbazî ji aliyê Pêşmerge ve tê sekinandin. Sala 1943 dîsa xebata pêşmergetiyê û bizava kurdî ji aliyê Mela Mistefa Barzanî ve dest pê dike.

Li gel damezrandina Komara Kurdistanê li bajarê Mihabadê, di sala 1946ê de, Mistefa Barzanî diçe Rojhilatê Kurdistanê û hêza xwe dixe xizmeta Komara Kurdistan li Mihabadê û bixwe jî wek Serok Erkanê Komarê hate hilbijartin.
Piştî ku Komara Kurdistanê hilweşiya, Mela Mistefa Barzanî bi pêşmergeyên xwe ve derbasî Sovyetê dibe lê li ser rê rastî êrişa hêzên Îranê tên û piştî şerekî mêrxasane derbasî Sovyetê dibin. 12 salan li Sovyetê dimîne û roja 26 Cotmeha 1958 vegeriya Iraqê. Hikûmeta wê demê ya Iraqê hinek soz dabûn kurdan lê dema Mela Mistefa dît hikûmetê sozên bicîh nehanî, Îlona 1961 dîsa dest bi şoreş û xebatê kir, wî şerî heta 11 Adara 1970 dirêj kir.
Roja 29 Îlona 1971 hikûmeta Iraqê hewl da Mela Mistefa tîror bike. Li ser wê bûyerê rojnamevanê Iraqî Seyf Dûrî dibêje, sal û nîvê piştî rêkeftina Adarê, berpirsê asayişa giştî ya Iraqê Nazim Gizaz hewl Mela Mistefa tîror bike lê nekarî.
Mela Mistefa Barzanî yê nemir ê Rêveberê Şoreşa rizgarixweza gelê Kurde, di sala 1979an de li nexwaşxaneyekî Amerîkayê çû ber dilovaniya xwedê.

# Şehîd Nesredîn Birhik di bîra her Kurdekî de zindî ye

Kurdistan

Roja 13ê Sibata sala 2012an de, şehîd Nesredîn Birhik ji aliyê girûpek nenas ve hate gulebarankirin, ji bo nexweşxaneya Nûr ya Qamişlo hate veguhestin. Lê ji ber giranbûna birînên wî ji bo nexweşxaneya Martînî ya Helebê hate veguhestin, tevî ku jê re çend neştergerî hatin kirin, lê ji ber birînên xwe di 22-2-2012an jiyana xwe ji dest da û şehîd bû.
Şehîd Nesredîn Birhik li gundê Kevrê Dena yê ser bi Çil Axa li Herêma Alyan ya Dirêka Rojavayê Kurdistanê sala 1960î de ji dayîk bûye , xwendina xwe ya seretayî û navendî li Çil Axa xwend, û ya amedayî li bajarê Hesekê berdewam kir, û li Dêrezorê bawernameya Peymangeha Pêşesazî beşê Elektirîkê bi dest xwe ve xist.

> **Bavê Ela xebatkarekî cêwaz û Kurdperwer**

Di despêka ciwaniya xwe de, tevlî Partiya Demoqrata Kurdî li Sûriyê El Partî bû, di gelek rêxistinan de beşdar kirin , û di Komîtên Partî de kar kiribû, ta ku 1998an de, bû Endamê Polîtbîroya Partî.
Bi dilpakî û dilsozî li ser rêbaza Barzaniyê nemir xizmeta doz û gelê xwe dikir, lewma rastî gelek astengî û rêgriyan dihat, di raperîna 2004an de hate binçavkirin, herweha sala 2009an ji aliyê rêjîma Esed ve hate binçavkirin, lê ew yek bandor li ser vîn û xebat wî nekir .
Di 13ê Sibata 2012an de, ji aliyê kesin nenas ve hate gulebarankirin, û di 22 heman mehê û salê de, Nesredîn Birhik Bavê Ela şehîd bû, bi beşdariyeke mezin ji şêniyên Rojavayê Kurdistanê li gundê xwe li Kevrê Dena bi xak hate spartin.



# Binçîneya Zimanê Kurdî



Rifet Hacî

Hewlêr

Li gorî rewşnasiya hin mafrewayên dîrokî di kok û derbûna gelê Kurd û pêkhatin û geşderbûna zimanê wî yê netewî de, Zimanê Kurdî bi sê qonaxên pey hev wek rêzbend di şaristaniya mirovatiyê tê spartin.

**Ew jî ev in:**
**Yekem:** Qonaxa rêxistina zimanê gelên Zagrosê yên kevnar, ew jî( Loloyî –Kûtî – Kasî – Soparî), ne ku di pengava xwe de gelekî nêzîkî hevdu bûn, bi şêweyekî hevbeş, li gorî derbirîna zanayê mazin M.Emîn Zekî,"hin ji rojhelatnasan diyar dikin ku zimanê wan gelên navbûrî, ji koma zimanên Arî hatine verijtin, herwiha hin zanayan jî di sepandin zimanên Qoqaziyan, tevlî ku hemi jî hevşax bûn".
**Duyem:** Tiştê tê xuyakirin ku ji koça (HindoEwropî) berev herêma rojhelatê ve destpê kiriye, di dawiya hezarê sisiyan û destpêka hezarê diduyan pêş zayînê, ku di koçberiya (Mîtaniyan–Hûriyan–Hissiyan)de dihate destnîşankirin, ya ku zimanên (HindoEwropî) zaravên çiyayî yê Zagrosê û Kurdistanê yên kevnar  desteser kirin.
**Sêyem:** Ji hezar saliya yekem pêş zayînê ve destpê dike, bi barkirina koçberî regezê tuxum Arî berev çiyayên Zagrosê ve warê Kurdistaniyên kevnar, û guncawbûna wan bi pêkhateyên resen ên navçeyê re, da ku koka tuxmekî bi pênaseya (Arî) bi mirovên xwe ve û ziman û dab û nerîtên xwe ve were dirustkirin.
Tê xuyankirin ku Zimanê Kurdî nasnameya xwe ya taybet bi kelaxê xwe yê temamî ji wê serdemê wergirtiye"destpêka hezarê yekem pêş zayînê" ku piraniya keristeyên xwe ji zimanê Mîdî yê wê demê wergirt û tê guncandin bi nerîna piraniya rojhelatnasan re li gorî ku hevberî di navbera gelek gotinên jêderî ji Zimanê Kurdistanî yê kevnar "Mîtanî" û zimanê Kurdî yê serdemî de dihat kirin, ku piraniya wan heman bêje û deg û wateyê didin.
Ji van mafbîniya rêzmankarên Kurd destpê dikin û binkeya Zimanê Kurdî wek zimanekî resenê Arî ji malbata zimanên (Silavî û Ewropî û Îranî) sepandin wek zimanekî serbixwe bi hezarên bêje û gotinên jêderî ligel rêzmana xwe ya tabet diçesibîne.
Ji vê baweriyê zana û zimannasên xwedan rol Zimanê Kurdî datînin di xaneya (zimanên Kevalî)de, lewra koka wî vedigerînin (zimanê Somerî)ku bêjeya rêzimanî têde bêje pal vedide li ser pêşgir û paşgiran ligel reg û karên çawikî ku dighêje bêhtir ji neh hezar çawikî, û 918123 gotinan bi xwe digre da ku di rêzê de li pêşiya zimanên navçeyê were mîna zimanên (Erebî, Tirkî û Farisî) li gorî amarên Wîkîpîdya Zimanê Kurdî derbasî programa ferhenga Azad kir ya ku pêşxistineke berfireh daye Zimanê Kurdî yê ku bêhtir ji 70 Milyon kes pê diaxivin li gor gotina Serokê Peymangiha Kurdî li Siwêsra Mihemed Karwanî.
Lewra diyar e, Zimanê Kurdî weke samanekî bi nirix û buha hevbeşê zimanên Zagrosnişînan û gelên Arî ye li ser xaka Kurdistanê hatiye dirustkirin û berdewam maye, ew jî nîşana resenbûn û hêza têkiliyên pêkhateyên navçeyê diyar dikin weke encamên siruştî ji pêkvejiyan û wardoziya xelkekî bi soz di cugrafiya kesan û cih de ku bi kesên hatibûn hinardekirin jibo herêmê diguncin û rewşeke hêmin dihate dîtin bi têgihiştin bi vî zimanî.

**Têbînî: Ji hin jêderan**

# Xerabî û xwarî ti carî dewam nake



Azad Haco Hemê

Tiltemir

Nasikirîye di duniya yê de tim du tişt an du babet hene mîna xêr û şer hezkirin û qehir sipî û reş bi rûkî û dirû rastî an xwarî û h..d. Ezê di vê gotara xwe de behsa rastî û xwariyê bikim û wan kesên bi wan ve girêdayî, naskirîye rastî ku baş bûne ciwamêr bûne rû nerim bûne dil paqij bûne raskêş bûne her dem alîgirê xêr û hêwir û wekheviyê her dem dûrî bercewendiyan dikive nexasim bercewendiyên kesayetî yên teng, lê xwarî nebaş bûne kêm ciwamêrî rû reşe dil reşe rê lêçe her dem li pey bercewedîyan e hezkerê tevliheviyê ye jiber ew dizane jibilî vê diyardeyê temenê wî kurte ne domdar e, Îcar herdû babet bihev re dimeşin her mirovek ji xwe re rêkê an babetekê dibjêre û dikevin nava hevrikiyê de, Pirrê caran di despêkê de heye radeyekê xwarî kariye rastiyê an rastan jiber xwe bide alî, çinkû xwarî an xirabî jê hêsantir tune bi wê zû dighê merem an mebestên ku ji bo wê dilive û dixebite ku ew jî bidestxistina qezncên madî an hin bercewendiyên kesayetî liser hesabê kesên rast û qenc jiber ev mirovê xirab tiştek pêre cuda nake ku ezîyetê bighê welat an bighê miletê wî jibilî xwe û bercewendiyên xwe bi tişkî dî ramyar nabe di xema xwe tenê de ye jiber timayî an payebûn wî kor dike, lê em werin li rastiyê an rastan bimeyizînin tê bişopîne ku cudahî di navbera wan de mîna zemîn û ezman e çinkû rastî pirr pîşeyên wê yên pak û resen hene, jê ku xwedî wijdan e welatparêz e hezkerê xaka xwe ye li ser rûmeta xwe ditrse pasewane liser ewlehiya miletê xwe û mafê wî, jiber vê ne her kes dikare rast be an rastiyê bicî û kar bîne û ew rastiya wî jî dê liser hesabê wî û tendirustiya wî be jiber tim girjî di navbera wî û yê xirab de heye, û ewê xirab bi xala herî lawaz di wî de digre, jiber dizane ewê rast xwe yekser bi terqala wî naxe, nexasim di nav an riwê xelkê de ji bo nebe pêkenîn di nav wan de ewê xirab çi alav çi tiştên ne baş û xirab hebe li dij wî bikar tîne.
Jê, yekem: Pîlanan bi her yekî pîs û gemar re hebe datîne da wî di nav xwe de dorpêç bikin û ti encam ji liv û tevgera wî re nahêlin û bandor jêre nemîne.
Duyem: Dibin kole li cem detshilata ji bo wî bitirsînin û bi êşînin dema kar ji bo doza xwe bike an livekê li dijî wan bavêje an ji bo tim qeyidkirî be.
Sêyem: Propgendayên reşkirinê ji sibê heya êvarî li dij wî bikar tînin ji bo wêneya wî xira bikin li cem dost û heval û xelkên derdora wî ew jî wek pilangeriyekê ku moralên wî bişkînin û rihê kar û xebatê libal wî lawaz û pûç bikin,
Hin mjarên din hene ku ez bihejmêrim û bînim ziman lê ez naxwazim ji vê dirêjtir bikim.
Lê tevî girjî û hevrikiya herî xurt di navbera xirab û rastan de û tevî eziyet û êş û zindan û îşkence û birçîbûn û jidestdana tendirustî û kuştin ku yê rast û rastiyê birêve dibe dît û dibîne ji wan gawir û xêrnexwazan ku bi sala kişand û dikşîne lê dawiya dawî wek wan xiraba namîne pend û mînakek Erebî heye dibêje ( Bil nihayê la yesih ile el sehîh) ew qas pîlan û didexis û dek û dolab nikarin meşa rastiyê rawestînin yan wê ji holê rahêjin rojek hat yan jî tê ji wan xiraba re dibê bes êdî radest bibe ew tehta ku te liser pîsîya xwe dikir baranê şuşt tu nema dikare dîsan genî bike çinku ji Xweda xafile nizane ku Xweda wiha dibêje di Qur'ana xwe ya pîroz de, piştî Bi navê Xwedayê Mezin û Dilovan ( Wela tehsubene ellahe xafilen eme yef'elehû el zalîmûn ) Rastgo Xwedayê mezin, Îcar merev çiqasî ji xwe haydar be wê baş be ciqasî merev sitemê lihev neke wê baş be çiqasî merev mirov be bi xeyinî xwe re wê baş be, merev şaştiyek kir û danpêdan bi şaştiya xwe kir û li xwe vegeriya wê baş be, ti carî bi xawrî û ez ezîyê merev biser nakeve û naghê ti dera ya baş merev qenc û baş be û xwedî perensîb be û wiha berdewam be ti car merev têk naçe, eger li cihekî an di şert û mercekî zehmet de de têk çû yeqîn û baweriya te hebe di çarçoveya giştî de ti car merev têk naçe jiber miletek heye merev teqyîm dike.

# Mîrê bizqê Seîd Yûsif.. Hunermendekî bêhempa

Hêvî Delî- Qamişlo

Hunermend ew kesên ku saz û awazên stranên wan di nava milet de li her cihî zindî dimîne, lê gava ku dengê lêdana Bizqa Kurdî di her malekê de tê bihîstin ev yek li bîra me tîne navê hunermendê Kurd yê navdar Mîrê Bizqê Seîd Yûsif, ku di nav civaka Kurdî de bi hestê stranên xwe yê netewayî û welatparêzî êş û derdên miletê Kurd ji cîhanê re diyar kir, ji bilî stranên evînîyê jî ku niha li ser zimanê her mirovekî de têne gotin.

> **«Deng û awazên Seîd Yûsif dê di bîra her Kurdekî bimîne»**

Di salvegera 4'emîn a koçbarkirina stranbêjê Kurd yê bi navûdeng Seîd Yûsif hêjaya ronahiyek ser Xebat, Jiyan, berhemên wî di warê hunerî de bînin ziman: Hunermendê kurd "Seîd Yûsif " yek ji hunermendên naskirî bû di nav Kurdan de, ku di dibistana muzîka Kurdî de xizmet di warê netewayî û ziman û stranan de Jiyana xwe derbas dikir, û gelek berhemên wî hatin tomar kirin zêdetirî 700 stran çêkirine û gotine bi saz û awazên xwe, li ser evînî, netewî, herwiha ser êş û derdên Kurdan tenî ziman, ku strana herî navdar bi navê "Qamişlo bajarê evînê" yekem hunermend bû ev nav li bajarê Qamişlo kir( Bajarê Evînê), ji vê yekê êdî bû xwedan dîrokeke dewlemend di hunera Kurdî de bi nivîsandin û gotina stranan bi awazên xwe, yê ku her dem di dilê Kurdan de zindî bimîne, û ji nifşekî bo nifşekî din re were bi bîranîn. Hunermend Seîd Yûsif hunermendekî nêzîkî gelek helbestvan û stranbêjan bû weku "Mihemed Şêxo,



Mehmûd Ezîz Şakir, û bi wan re sala 1973'an de, koma Newroz li Beyrûtê damezirandin û ku ew wekî kesekî yekem bû ku amûra bizqê derbasî Kurdistana Sûriyê kiriye û êdî bi navê Mîrê Bizqa Kurdî dihata naskirin. Hunermend Mîrê Bizqê Seîd Yûsif, di warê hunerî de navê wî li deverê û li cîhanê hatibû naskirin bi xebata wî ya berfireh a têkoşîna hunerî ya bêwestan û hewlên wî ji bo pêşxistina muzîk, strana Kurdî de dikir, û ji ber stranên wî yên evînî û gelêrî û Neteweyî bi dengê wî yê zelal û xweş, li ser asta Herêmî û navneteweyî û cîhanî zêdetirî 25 xelatên rêzgirtinê ji bo nirxandina berhem û xebata wî ya hunera Kurdî ji dezgehan di warê muzîkê de bidest xistibû. Hêjaya were gotin ku hunermend Seîd Yûsif ji dayîkbûna sala 1947'an, li bajarê Qamişlo yê Kurdistana Sûriyê, ku Jiyana xwe di dibistana hunerî û xizmeteke mezin a muzîk û stranên Kurdî de derbas dikir, lê ev hunermend li peyî xwe samanek mezin û dewlemend a hunerî hişt, di 26'ê sala 2020'an, li nexweşxaneyeke Tirkiyê de ji sedema nexweşiya Pençeşêrê hunermend Seîd Yûsif çû ber dilovaniya xwedê, û di roja 29ê heman mehê, bi rêya deriyê Sêmalka derbasî Kurdistana Sûriyê bû û bi merasîmeke geş ji aliyê milet û partiyên siyasî û kesayetên serbixwe û rewşenbîr ve hate pêşwazîkirin û li goristana Qidûrbek ya li bajarê Qamişlo bi xakê hat spartin.

> **«Seîd Yûsif di salên zehmet de stranên netewî gotine»**

Mîrê Bizqa Kurdî Seîd Yûsif ew dê tim bi deng û awaz bi hunera xwe ya bilind di bîra her Kurdekî de bimîne.

## Para hejaran



Firyal Hemîd

Libek e Gênim
li zeviyekê hate
çandin
Piştî bûrîna zivistan û
beharê,
Tîna Horê
simbilên serdandî
radestî patozê kirin
Li êş bû ard
Û bi kulmek e avî bû
hevîr di zikê Tenûra
germ de
Girka pêşî biser
komerê de
hate xwar
Û bû para bizna Zero
Yê li pişta tenûrê bû
Nan
Û Xwe kire firavîna
maldaran
Hilma nên bû para
hejaran

# Gewîlan.. Çalakiyek bi boneya Roja Zimanê Dayik ya Cîhanî

Kurdistan- Kampa Gewîlan

Bi boneya Roja Cîhanî Ya Zimanê Dayikê nûnertiya Yekîtiya Niviskarên Kurdistana Sûriyê li Herêma Kurdistanê - Şaxê Duhok (Gewîlan) êvareke wêjeyî hunerî lidarxist. Têde nivîskar Idrîs Hiso semînarek li vê rojê, rewşa Zimanê Kurdî û aso û qonaxên xebata gelê Kurd jibo pêşxistin û parastina zimanê dayikê ku hîmê bingehîne jibo parastina her neteweyekê bi taybet neteweyên ku heta niha negihane mafê serbestî û azadiya xwe. Herwiha tekezî li ser qurbaniyên mezin ku Kurdan jibo mafê danpêdan, xwendin, û perwerdeyê bi zimanê dayikê li seranserî Kurdistanê û diyasporayê dane kir. Her yek ji helbestvan Şiyar Alyanî û helbestvan Babîsok Amûdê gurzek ji helbestên xwe xwendin, têde girîngiya parastina zimanê dayikê û parastina nasnameya neteweyî berz ragirtin. Ji aliyê xwe ve hunermend Mihemedxêr Silêman bi stranên xwe şevbuhêrik bi coş û hêris kir. Çalakî bi stran govend û kêf û xweşî bidawî bû.

